

MERCÊN KIRYARA REXNEYÎ

Sebîh Mihemed Hesen

Gelek caran ev pirsyar e dihête kirin: Erê gelo me rexne heye? Em jî weku nivêsera ereb "Xade el Seman" dê bêjin: Mirov her gav pirsyara wan tiştan dike yên ku hebûna wan di gumanê de. Anku heger me bi duristî rexne hebaye, me çu caran, ev pirsyar e ji xwe nedikir. Di gelek helkeftin û nivîsînan de, me dupatkririye ku rexne weku tiyor û rêbaz hêşta li cem me peyeda nebûye, ji berku karê rexneyê hindek pîver û merc hene wek:

1-Li serhev kombûna deqan, ez dibêjim heta radeyekê ev çend e li dev me peyada bûye. Belê hêşta ne li wî astiye ku bibe faktorekê palder bo peydabûna rexneyê. Çinku gelek ji wan nivîsînan nagehine astê deqek edebî, xwedanên wan ji ber hindek egeran, dest bi nivîsînê kiriye; wek: hilgirtina navê nivîserî, kuştina wextî, tejîkirina berperên rojnameyê. Bi destveanîna hindek destkeftan wek mûçeyê rêzlênanê. Bi wateyeke dî, nivîserên bi rast, ji tiplên destan gelek naborin…

2-Peydabûna gencîneya me'rifî, ev çend e jî bi xwendina berdewam û dûçûna jêderên ji nû derdikevin û zanîna çendîn zimanan nebe, peyda nabe. Bi hizra min jî, rewşenbîrê li vî astî jî hêşta me nîne û ez nebawer im li paşerojek nêzîk jî diyar bibe. Çinku kawdanên babetî û navxweyiyên vê diyardeyê neguncayî ne, belku zêdebûna rojname û kovaran bûye egerekê serekî ku hemû nivîsîn kurt û serveserve bin.

3-Dûrketin ji zimanê erebî egerekê herî giring e ji bo nezanîna nûtirîn tiyor û rêbazên rexneyî, ji ber ku wergitina wan tiyoran bi zimanê

kurdî û bi taybetî zaravê kirmancî, karekê gelek bi zehmet e, heker nebêjin mehal e. Heker em sehbikine nivîserên ereb, dê bînin her gav gazindeyan ji zimanê xwe yê wegêranê dikin û dibêjin ew neşên bi duristî tiyorên bunyatgerî û hilweşîngerî û htd, têbigehin. Vêca çawa xwendevan û nivîserê me yê evro, ewê nêzîktirîn ziman bo me, nizanit, dêşêt wan tiyor û rêbazên rexneyî wergirin? Vêca ka heta ew nivîser bo mercên ku bêşêt êkser wan tiyor û rêbaz bi zimanê wan yên dayîk bixwîne û paşê li ser berhemê me piraktîze bikin. ji ber vê çendê jî behra pitira bizavên me yên rexneyî lawaz û daxbarî ne.

4-Rêzgirtin û razîbûn bi yê beranber, ev jî di kiryara rexneyê de şengesteyekê serekî ye. nivîserên me jî, ji berku xwedan kûratiyeka rewşenbîrî nîne û ji berpêyên xwe wêvetir nabînin û her êk duholqutê layengirekî ye û ji mûçeyên xwe ditirsin, her gava xwe ji hemûyan duristir û rastir dadinin û xwe ji hemû boçûn û şirovekirina metirs dibînin û ew tiştê ew dinivîsînin nabe bikeve jêr çi karekê rexneyî, çinku dê kartêkirinê li kesayetiya wan ya rewşenbîrî bike. Çinku nivîserê me, wesa nadanin ku tiştekê ew nivîsînên belav dibin êdî ne milkê wî ye. Belku wesa dihijmîre her weku pişkek ji wî û kesê maf nîne destê xwe bikitê, hosa her rexneyeka bihête kirin dê wek karekê dijminkarî û xwedan niyetên xerab hête hijmatin. Her ji ber vê êkê jî, em dibînin nivîsînên rexneyî; ji bilî rexneya sade û arastekirî, rexneya kûr û avaker li ser berperên kovar rojnameyan gelek kêm in.

5-Hebûna kesayetiya serbixwe û xwedan helwîst, ev jî her wek aşkere li dev hemû kesan, qeyraneka rewşenbîrî û siyasiya gelek mezin e di nav civakê me yê kurdî de. Çinku desthelatê; bi taybetî her du partên serekî, bizavên êklaker kirîne ji bo kontirolkirina texa rewşenbîrî, ev texa ku dişê kêmasî û xeletî û serdeçûnên desthelatê bêxe berçavên xelkê. Evê çendê jî karekê negatîv kiriye ser gorepana rewşenbîriya kurdî nehêlaye kesekê serbixwe bi tinê jî serê xwe rake û her gava hindî serê derzîkê jî nav û dengê kesekê rewşenbîr derbikeve her êkser çetên rewşenbîrî dê çin xwe gehînê û kirine dibin perê desthelatê ve, da her gav gorepan ji dengên rexneyê û aşkere rakirina xelatiya, valabin, evê çendê jî wek hemû biyavên dî, bandoreka mezin êxiste ser rewşa edebiya kurdî û nehêla ew rexnegirê me divê yê dûr ji hemû karkirinên siyasî û civakî û rewşenbîrî yê serbixwe û xwedan şiyanên mezin, serê xwe bilind bikin.